

# Jin, Ziman û Berxwedan

**Cemile Turhalli**

Cinî, Cuye, Ziwan

**Roza Metîna**

Zimanê Kurdî Stûna  
Berxwedanê Ye

**Feride Akturan**

Ziwan Estbiyayena  
Milet a


**Devrîm Demîr**

Di Wêjeya Devkî Ya Kurdî De  
Jin: Jin Bîra Veşartî Ya Wêjeya  
Devkî Ne

**Didem Yılmaz**

Eril Edebiyata Karşı Bir Duruş:  
Leyla Erbil

**15 Gulanê  
Cejna  
Zimanê Kurdî  
Pîroz Be**



# İÇİNDEKİLER

- 1** Cinî, Cuye, Ziwan  
Cemile Turhallı
- 4** Zimanê Kurdî Stûna Berxwedanê ye  
Roza Metîna
- 7** Ziwan Estbiyayena Milet a  
Feride Akturan
- 12** Di Wêjeya Devkî Ya Kurdî De Jin: Jin Bîra Veşartî Ya Wêjeya  
Devkî Ne  
Devrîm Demîr
- 15** Eril Edebiyata Karşı Bir Duruş: Leyla Erbil  
Didem Yılmaz

## Cinî, Cuye, Ziwan

Cemile Turhallı-10 Mayıs 2026



*Taybetmendîya merdimî komelkîya înan o. Komelkîye zî bi dorûverê cinîyan de ziwan reyde virazîyayo. Seba ke merdim ewilê ewilan xo nas keno, naskerdişê xo ra pey merdimanê bînan şinasneno, dima înan ê bînan ra cêra keno, o çax ziwanê înan de sentaksêko kolektîf bingeyîya ziwanî nîşan dano*

Cinî versîya parsû ra nê, hişmendîya herre, herikîyayîşê awe, kila adir û helmê roje ra virazîyaya.

Destê cinî de îtaat çinî bi, toxim est bi. Toximan ra cuyê neweyî berz bîyêne. Kîştîş çinî bi zanayîşê aye de hertim şîfa her ca ra vila bîyêne. Cinî rîtmê xoza weş zanayêne, ewilê ewilan nê rîtmî ra hêz girewt no rîtm kerd ritmê lorîyan. Dima nê rîtmî ra hîsê keyeyê xo, hîsê komelê xo ardî ziwan. Heskerdiş, wijdan, hêrs, pers, dejê xo heme ardî kerdî pêser û nînan deyîranê xo de bi şeklêk îfade kerdî. Çimê aye de sebrê estareyan, verika aye de şefqetê koyan, destê aye de dermanê weşîye, fekê aye ra deyîrê çeman her roje dinya ra vila bîyêne.

Tenayîya cuye bi destê cinîyan bedilîya, cuye kerd bi cuya zafhûmare. Na cuye de zafziwanîye, zafkulturiye, zafbaweriye est bîy. Semedê dinya cinîyî bîyî sitar(sixinak) raştî dima ra zî bîye serewedaritişê şaran. Leşa xo de hem birîna xo hem zî şefqetê xo temerna, bêvengîya xo de ziwanê xo eşt zereyê laseran resna dewê bînan, surgunîya xo de kokê xo ra neslêko newe awan kerd. Her wextan de xo newe ra newe ard dinya û xo ard vîrê her kesî.

Demo modern de merdimîye waşte ke estanekê cinîyan wa nêreso û nêyarê vîrê kesêkî. Seba aye tarîxê fermî de nameyê cinîyan çinî bi. Wina aseno ke cinîyî nuştayan de ameyî vîndîkerdene labelê vîrê komelî de vîndî nêbîyî.

Bîyayîşê merdimî, mîtolojîya êzidîyan de xo weş mojneno. Goreyê înan, no wina yeno vatene. ‘Erdê ma de ewilê ewilan cinîyî werizênî, dima tîje vejêna, seba ke cinîyî tîje ardêne dinya’

No metafor û vatiş bîyayîşê dinya de rolê cinîyan bi estetîk weş ano ziwan. Hem xoza de cayê cinîyan kerdox qebul keno hem zî kedkarîya înan nîşan dano.

Taybetmendîya merdimî komelkîya înan o. Komelkîye zî bi dorûverê cinîyan de ziwan reyde virazîyayo. Seba ke merdim ewilê ewilan xo nas keno, naskerdişê xo ra pey merdimanê bînan şinasneno, dima înan ê bînan ra cêra keno, o çax ziwanê înan de sentaksêko kolektîf bingeyîya ziwani nîşan dano.

Kulturê kurdan de eke ma tesîrê modernîzmê neweyî vejî, cinî kirîştuxa kulturê komelê xo ya. Ziwan zî zereyê na newale de lingêka sereke ya. A erjanê komelê xo ziwani reyde û bi şeklêko vatedar xo resnena neslanê bînan. Hem ziwan resnena neslo newe hem zî helwestê komelî her kesî nîşan dana. Bawerî dana merdiman, barê komelî gêna serê milê bînan. Mabenê merdiman de piştîyayewbînan girewtîşî girê dana û hîsêko wijdanî virazena.

Tablet û peykerê verênan de, sembole cinîyan bi manaya bereketî ameyo nîşandayene. Nê heme simbolî bi hişê înan û averşîyayîşê ziwani înan zî nîşan danê. Deyîran de, melqatikan de vateyê verênan de rolê cinîyan zî hertim aseno ke semedê şarê xo kesêk nîyî, her çî yî. Bereketê leşa înan de bîyayîş merdim dest pêkeno heta bereketê xoza û heta neqlkerdişê kulturî. Neqlkerdiş de eke hîs çinî bi eke bawerî çinî bî qebulkerdişê kulturî zî asan nêbeno. Wina aseno ke no rasyonâlîte bi vateyê verênanê diyalektê kurmançî de xo weş mojneno. ‘Bav pişt e, dê her tişt e’.

Averşîyayîş de her çî bi goreyê sistemê xo şono. Xoza girêdayîya ekosistemê xo ya, leşe goreyê sistemê xo şuxulîyena, komel zî goreyê ewnîyayîş, zanayîş û waştişê xo bi îradeya xo ya xosere, xo rêxistin keno, o zî beno sistemê cuya komelî.

Cuye de çend erjê demokratîkî est ê hende zî komel de pêrodayîş sey dewrê neolîtîkî kêmi bi. Nê dewrî de cinî sey erjê komelî ameybî qebulkerdene. Wexto ke dewrê matrîarkale

kewt binê patriarkalî o çax ra pey cinî kerdoxîya xo vîndî kerde bî talî, leşa aye zî kewt sîstemê kontrolê camêrdperestî.

Nika cinîyî serewedaritişê bêhempayî danî. No xoverdayîş tena semedê azadîya cinîyan nîyo semedê azadîya şarê xo zî yo. Çunke ne azadîya xo ne zî şarê xo yewbînan ra cêr-cor vînenî. Senî merdim destê xo destê bînî ra nêşkeno qij bivîno, cinî zî di destê xo semedê cuya komelî ferz vînenî.

Nika çar hetê Kurdîstanî de bi pêşengîya cinîyan cuyêka newîye awan beno. Rolê awankerdoxî 4 hezar serran ra pey reyna cinîyê kurdî girewtî destê xo. Destmala înan çar hetê dinya de bîya govenda azadîya cinîyan. Porê înan bîyo sembolê xoverdayîşê azadîye. Ziwanê înan semedê dinya bîyo motîvasyonê serewedaritişê cinîyan. Sloganê ‘Jin, Jîyan, Azadî’ bîyo sembolê cuya azade. Bi vatişê înan bê cinî cuye nêbena, cuye zî bê ziwani nêbena. Cinîyî xo ver danî rîpelêko newe û dewrêko newe semedê merdimîye dîyar kenî. Nameyê nê dewrî zî komelo demokratîk o komunal o. Nika ra pey rojhelato mîyanên de vengê guleyê tifingan nê erja komunale, modelêko newe xo her ca de awan keno. Bêguman proseso newe de awankerdoxa komelê demokratîkî do cinî biba. Cinîyî bi vatişê xo ‘Jin, Jîyan, Azadî’ nika ra pey zî ziwani xo reyde cuyêka newa awan kenî bi vatişê xo ‘cinî, cuye, ziwani’ mîlyonan heriknenî.

## Zimanê Kurdî Stûna Berxwedanê ye

Roza Metîna-10 Mayıs 2026



**Zimanê Kurdî ji dîrokê heta niha bi dewlemendî û koka xwe ya zexm tevî êrişan li ser piyan maye. Ev hêz mîna efsûnekê ye û ne ji rêzê ye. Îsal jî em ê bi vê dewlemendî û efsûnê 15'ê Gulanê roja Cejna Zimanê Kurdî pêşwazî bikin**

Zimanê Kurdî yê di nava malbata Hînd Ewropayî de ye gelekî dewlemend e. Jêderka şaristanî û felsefeyê ke kûr e. Çiqasî jî bi salan bi tundiyeke mezin rû bi rû mabe jî her li ber xwe daye. Li dijî nîjadperestî û cihêkariyê hîn jî hewil dide li ser piyan bimîne. Gelek navdarên li cihanê dema behsa zimanê kurdî dikin di warê dîrok û dewlemendiyê de hêjayî pesindayînê dibînin. Ne tenê ziman di heman demê de pesnê şaristanî û felsefeya kurdan jî vedidin. Ev jî ne tiştêkî ji rêzê ye.

### Zimanê Kurdî stûna berxwedanê ye

Zimanê Kurdî stûna berxwedanê ye. Ev helbet ne tenê gotinek e. Her wiha ji bo em dewlemendî û qiymeta zimanê xwe baştir bizanibin divê em dîroka zimanê kurdî bizanibin. Divê em guh nedin gotinên li dijî zimanê kurdî yê nîjadperestan. Em dema li dîroka zimanê kurdî dinêrin em dibînin ku çiqasî xwediyê wateyê mezin e. Em ji fermenga etîmolojiyê dest pê bikin. Çar hezar sal berê ferhenga kurdî hebûye. Navê wê ferhengê yê 4 hezar sal berê sanskritçe (Hîndiya berê) Nirûkta Vedenga bû. Bi navê niha Nirxê Vedenga. Ev ferhenga etîmolojiyê ye. Hinek kesên nîjadperest û dijminên kurdan dema dibêjin 'ma kurdî jî ziman e' bila binêrin ku dîroka zimanê kurdî çiqasî kevin e. Dema em li ferhenga etîmolojiyê ya kurdî û tirkî dinêrin em dibînin ku ya bi kurdî kevnartir û

dewlementir e. Ya tirkî jî 950 sal berê hatiye nivîsandin. Wexta em vê rastiya dîrokî baş bizanibin em ê li gor wê jî bikaribin bi hêztir zimanê xwe biparêzin.

### **Ferhenga dîrokî**

Ferhengên dîrokî di heman demê de rastiya dewlemendiya gelekî jî nîşan dide. Em niha binêrin bê ev ferhenga etîmolojiyê bi çi awayî bi çi armancê hatiye amade kirin. Zimanê kurdî ji Kurdistanê heya li Îran, Anatolya, Belûcîstan û Hîndîstanê belav bû. Ji tevahiya vê herêmê re Aryan tê gotin. Hindî navê Aryan pîroz dibînin. Li gor Hîndîstaniyên berê 'axaftin û deng di nava kodên afrînêr de veşartî ye'. Li gor wan di her deng û peyvên de kodên îlahî yên kûr hene. Loma peyvên Aryanî koka wan ji bo wan girîng bû û ferhenga etîmolojiyê nivîsandin. Ev ferhenga ku kokên gotinên sanskritî vedibêje di heman demê de koka peyvên kurdî jî vedibêje. Çimkî milê malbata zimanê Aryan a Hînt Ewropayî kurmancî, zimanên hîndî, tatî, talişkî, belûçkî, farisî, urdukî, peştûcî, gilakçî, mazanderancî, osetkî ye. Her wiha dora du hezar sal berê ji aliyê mezinên kurdan ve pirtûka kurdî Avesta jî hatiye nivîsandin. Avesta ji 21 pirtûkan pêk tê. Di serdema êrişên Îskender de gelek ji van pirtûkan hatin tunekirin lê 3 heb gihaşt heta roja îro. Gelek pirtûk û jêderkên şaristaniyê yên kurdan ji aliyê êrişkaran ve hatine tunekirin. Ev êriş di heman demê de li dijî hebûna Gelê Kurd e.

### **Ziman eynîka dîrokê ye**

Kevneşopiya zimanê kurdî ya xwediyê şaristaniyeke kûr e divê baş bê famkirin. Heta neyê famkirin wê têra xwe û baş neyê parastin jî. Kurdî ji Kurmancî, Soranî, Dimilkî, Kelhûrî, Lorî, Hewramî (Goranî) pêk tê. Kesên li ser zarava û etimolojiya kurdî ne xwediyê agahiyê ne dikarin gotinên eletewş ên mîna 'kurmancî tenî ji 300 peyvên pêk tê' bikin. Lê dema em bi dîrokê bizanibin em ê rê nedin gotinên bi vî rengî. Tevî dîroka zimanê kurdî em dîroka gelê kurd jî divê baş bizanibin. Împeratoriya Medan berî zayinê 678'an de yanî nêzî du hezar û 700 sal berê ava bû. Dîrokzanê serdema navîn Hayton wiha dibêje "et medi qui cordins" yanî 'Medî ku ew kurd in' û zimanê vê şaristaniyê bi kurdî bû. Zimanê kurdî li gor hinek lêkolînan herî kêm bûye zimanê 30 dewletên ku hatine avakirin. Di heman demê de medreseyan kurdan berî îslamê û piştî îslamê di 12 beşên cuda de perwerde daye. Di beşên zanistê de jî perwerde hatiye dayin. Kesên di dibistanên kurd de mezûn dibûn ji wan re dazde dihat gotin. Ev tê wateya dozdeh. Çima 12? Ji ber tê wateya pisporiya di 12 beşên ilm û zanistiyê de. Yê di dîroka cîhanê de robotê yekem îcat kiriye Ebûl Îz El Cezîrî ye. Ango Ebûl Îzê Cizîrî. Ew li dibistanên kurdan bi hînbûna 12 ilman pêş ket. Di qada nebatan de jî Ebû Henîfe Dînewerî ye kurd e. Ew jî li dibistanên kurd hîn bû. Bavê mûzika sîstematik

Mûhamed Erbîlî ye. Loma ziman di heman demê de dîrok e. Xwedîderketina li zimên xwedîderketina li dîrokê ye. Ziman eynika dîrokê ye.

### **Zimanê Kurdî kevneşopiyeke girîng e**

Zimanê Kurdî bi dîroka xwe û bi hebûna xwe di dîrokê de xwe ispat kiriye. Di zimanê kurdî yê şaristaniyê de ji milyonekê bêtir peyv hene. Li gor Kovara Zanistê ya Navneteweyî ya Scienceyê li gor gelek lêkolînan ziman ji cihên şoreşa çandinîtiyê lê pêk hatine derketiye. Ev lêkolîn li gor testên DNA'yê jî hatine kirin. Lêkolînên ku ji aliyê Zanîngeha Pensîlvanyayê û Zelandaya Nû Aûcklandê hatine kirin, li ser Kovara Zanistê ya Navneteweyî ya Scienceyê hat weşandin. Kesên ku dijminên zimanê kurdî ne naxwazin vê rastiyê bibînin û berovajî vê rastiyê dipeyivin. Lê ya rast ew e ku em ji dîroka xwe haydar bin. Li ser vê yekê dixwazim du mînakên bidim; Hazim Hacani di pirtûka xwe ya erebî ya bi navê "Sefehatun Min Tarîxi'l-Kurd we Kurdistan" de wiha dibêje: "Hinek tabletên bi nivîsa mîxî ya bi kurdî hatine nivîsandin û behsa Tofana Nûh dikin hene. Ev tablet niha li Muzeya Londrayê tên parastin. Li ser veyra di rojnameya wtu'r-Rafideyn" gotarek tê parvekirin. Di gotarê de tê gotin ku 'Nivîsa mîxî ya bi zimanekî di roja me ya îro de bûyereke mezin e. Lê belê têra xwe nehatine danasîn. Ev jî bêbextiyek e. Ev bûyer kevnariya zimanê kurdî ya dîrokê nîşan dide'. Li gor hinek çavkaniyan jî tê gotin ku Berî Zayinê di dawiya sedsala 4'emîn de bi hilweşandina Împaratoriya Ixmînî re kurd dev ji bikaranîna nivîsina mîxî berdidin û alfabeya Yewnanî û Aramî bi kar tînin. Hinek tekstên bi kurdî yê bi van alfabeyan hatine nivîsandin 'Kîtabeyên Hewramî ne'. Zimanê kurdî û gramera wê xwediyê kevneşopiyeke girîng e. Ev kevneşopî nûnertiya nasnameya Kurdî jî dike.

### **Kurdî çavkaniya hilberîna ye**

Kurdî her tim bûye çavkaniya hilberîna ye. Çimkî zimanek bîngeha çand, huner û jiyana gelekî ye. Ev di nava gelek lêkolînan de hatiye bi cih kirin. Dema em li hinek lêkolînên din jî dinêrin em dîsa dibînin ku kurd di warê ziman, zanist û dîrokê de çiqasî pêşketî ne. Mînakekê vê lêkolînê bi vî rengî ye. Xelîfeyê Îslamê meraq dike ku xelqên qedîm kîja alfabeyê bi kar tînin. Berî 1165 sal berê Dîrokzanê Keldanî li ser vê yekê dixwaze pirtûkekê bê nivîsandin. Bi Îbn Vahşiyê didin nivîsandin. Îbn Vahşiyê rave dike ku wî 30 pirtûkên bi kurdî yê li ser teknîk û zanista bi kurdiya resen dîtîye. Bi alfabeya bi navê Masî Soratî hatiye nivîsandin. Li gor van agahiyan alfeya kurdan a resen hebûye. Di van pirtûkan de tê gotin ku kurd di warê cotkariyê de gelê herî baş e. Her wiha tê gotin ku kurd bi Keldaniyên ku di warê zanistê de gelekî baş bûn re di warê zanistiyê de di nava pêşbaziyê de bûn. Ev agahiyeke gelekî bi qîmet û bi rûmet e. Wê demê ya dikeve ser milê me jî xwedîderketina li vê rûmetê ye.

## Ziwan Estbiyayena Milet a

Feride Akturan-10 Mayıs 2026



*Seba ke ma zaravayê Kirmanckî (Dimilî/Kirdkî) vîndîbîyayîşî ra bixelisnê; lazimo ke ma verî tahrîbatî kemî bikerî. Qandê coy, ganî ma bi hawayêko kolektîf û her warî de xebatêka xurt bikerî. Nê xebatî tena seba qiseykerdişî nê, seba pawitişê/miqaytebiyîşê vîr û kulturê bê zî. Lazimo ma vîr û kultirî zî bidê cuyayîş*

Ziwanê ma, nasnameyê ma yo. Eke şar biwazê estbîyena xo bipawê, ganî ziwanê xo bipawê. Ziwanê mayê tenê seba qiseykerdenê nîyo; o vîrê, kultur û ruhê şarî yo.

Ziwan, kulturê vizêrênî, teslîmê ameyoxî keno. Eke ziwanê ma bîbo vindi, şar zî beno vindi. Meseleyê ma, deyîrê ma, sanikê ma pêro bi Kirmanckî ameyê vatenê. Nê ziwanî ra dûrî kewtiş, kokê xo ra dûrî kewtiş o.

**Perwerdeya bi Ziwanê Maye Heqê Merdimeyî yo;** Her doman heq keno ke bi ziwanê xo perwerde bivîno.

Ziwanzano namdar, **Noam Chomsky** grîngiya ziwanî ser vano; Ziwan tena qisey/vatene niyo , ziwan edet, kultur û tarîxê biyayîşê merdimey o.

Fîlozof Ludwig Wittgenstein, kitabê xo yê bi nameyê *Tractatus Logico-Philosophicus* de bi na vatena xo girîngîya ziwanî nîşan dano: **“Sînorê ziwanê kesî, sînorê dinyayê kesî yo.”**

Goreyê cigêrayîşanê pedagojîkî, domanê ke bi zıwanê maya xo ya perwerde bibê, her tim serkewte benê. Çunke domanî bi zıwanê xo hîna weş fehm kenê, hîna rehet xo îfade kenê û fikrê xo hîna hîra kenê û rehet musenê. Xo bawerîya înan vêşî bena: Domanî xo xerîb nêvînenê, qiseykerdena xo ra nêşermayenê.

Zıwanê mayê “hîmê” her çiyî yo. Ganî Kirmanckî tena zıwanê keyeyî nîbo; bibo zıwanê perwerde û zanistî zî. Domanê ma ke bi Kirmanckî gird bê, ê do ameyoxî xo de zî nasnameya xo rê wayîr bivejîyê.

Vatena Wittgensteinî, mucadeleyê zonê mayî; rasterast bi azadiya fikriyayîşîya girêdayêya. Qeçeko ke nêşikîno bi zıwanê maya xo ya perwerde bivîno, xo îfadekerdiş de zehmetî anceno û serkewtena ci ya akademîk xirab bena û averşiyayîşê domanan ê komeleyî sero zî tesîrê do xirab virazeno:

- Çunke waştên û qabîliyetê înan ê zıwanî kemî beno, fehmkerdiş de zehmetî anceno; nêşikîno fikranê xo îfade bikero, xo serkewte nêvînenê û xobawerîya xo vîndî keno.
- Domanî xo embazanê xo ra ciya vînenê, asîmîle benê ya zî xo her çî ra durî fînenê û problemê aidiyetî ciwîyenê.
- Zehmetiyê musayîşî vejîyenê, no zî eleqeyê înan ê dersan kemi kenê, heznêkerdişê mektebî û nêwaştên domnayîşê mektebî vejînenê werte. No zî beno sebebê kemiya motivasyonî.
- Eke keye de domanî zaf paştî nêvînenê, xezneya keliman/çekuyan û quwetê îfadeyî yê bi zıwanê xo sînorkerde maneno. Seba ke zıwanê xo zaf nêgirwênê, zıwanê mayî hêdî, hêdî zeyif beno.

Rewşa zıwanê **Kirmanckî**, Zazakî, **Dimilî**, **Kirdkî**) ewro hem bi hetê îmkanan hem zî bi hetê rîskan ra qonaxêka krîtîk de ya.

- Mixabin di mîyanê keyeyan de qiseykerdişê kirmancî kêmi biyo. Genc û domanê (qeçê) ma êdî zafêrî bi tirkî qisey kenê. Yanê Asîmîle biye.
- Bi koçkerdişê dewan ra ver bi sûkan , kirmanckî xozaya xo ya raştekinî kêmi kerda û binê tesîrê zıwanê serdest de mend o.

### **Zıwanê Kurdî; zaravaya Kirdkî /Dimilî/ Kirmanckî Senî Averşiro**

Goreyê netîceyê rapora UNESCO yî Zıwanê Kurdî;Zaravaya Kirdkî/Dimilî telukeyê vindîbiyîşî de ro !!!!!

Seba ke ma zaravayê Kirmanckî (Dimilî/Kirdkî) vîndîbîyayîşî ra bixelisnê; lazimo ke ma verî tahrîbatî kemî bikerî. Qandê coy, ganî ma bi hawayêko kolektîf û her warî de xebatêka xurt bikerî. Nê xebatî tena seba qiseykerdişî nê, seba pawitişê/miqaytebiyîşê vîr û kulturê bê zî. Lazimo ma vîr û kultirî zî bidê cuyayîş. Qandê coy zî lazimo ke nê gamanê bingehênî bêre eştiş:

Cayê pawitişê ziwani keye yo. Labelê wexto ke paştîdayena saziyanê fermî çin bo, seba ke mabênê neslan de qutbîyayîş nêbo, ganî stratejîya “hêlînê ziwani” bêre kerdene. Bi taybetî saziyan de kar û xebatê ziwani bêre kerdene.

- Domannan de tena bi Kirmanckî qisey bêre kerdene ke ziwani bibo “ziwanê keyeyî.”
- Ganî dayîk û pîy, domananê xo rê bidê famkerdiş ke “muhîmiya ziwani dayike û zanayîşê ziwani ,famkerden û averşîyayîşê înan rê çend avantajêko pîl o “. No famkerdiş do zî domanan de wasteka qisekerdişê kirmanckî virazo

Seba ke mabênê fekê herêman o cîya-cîyan wedarîyo û prestîjê ziwani berz bibo, ganî nuştişê de yew standard bêro teşvîqkerdene.

- Seba hewcedarîyanê modernî (teknolojî, zanist, huner) ganî çekuyê neweyî bêre viraştiş/awankerdiş. Tay herêman de zaf çekuyê Kurmancî, Turkî û Farisî dekwetê zawanê ma mîyan; ma ganî çekuyanê rasteqîneyan ê ziwani xo bîyarî meydan û bigurwênê.
- Seba doman û pîlan ganî kîtabê gramerî, setê hîkayeyan/ estanikan û materyalê bi resiman bêre amadekerdene.
- Seba ke neslê newe eleqe nîşanê ziwani bidê, ganî ziwani dijîtale dinyayî de bibo “aktîf” û “averşîyaye” .
- YouTube, podcast û medyaya komelî ser ra ganî bi Kirmanckî çiyê balkêşî bêre amadekerdene.
- Aplikasyonê ferhengan, amûrê açarnayîşî û destegê klavyeyî ganî bêre herakerdene.
- Telewizyonanê ma de bernameyê goreyê , domanan û ciniyan û goreyê emrê şaran bernameyê cîya cîyayê ke balê înan biancê bêre hadrekerdene û bieywaşanê
- Embazê ma yê kurmancan rê zî wezîfeyo sereke yo ke ê zî zarawaya Kirmanckî bimusê û bimusnê. Mamosteyê ma yê zaravayê kurmanciyê lazimo ke ê demildest dest bi musayîşê Kirmanckî bikerê.

### **Qeydkerdişê vîrê Kulturî**

Kulturê fekkî, xezîneya en pîl a Kirmanckî ya. Ganî no xezîne vîndî nêbo û bêro qeydkerdene.

- Estanîkî, mîtolojî, vateyê verênan û tarixo mehallî yo ke pîr û kalê ma zanê, ganî bêrê qeydkerdene.
- Efsaneyê herêmi (zey Pirdo Des Çimeyî) ganî bi hawayêko modern bêrê nuştene û seba şanoyî (tîyatroyê) bêrê amadekerdene.

### **Heqê ziwane dayike û wastekê waro pêroyî**

Ziwan heya nêbo fermî; xebatê ziwani nêbê azad, averşiyayîşî de serkewte nêbeno.

- Bi destê şaredariyan û dezgehanê sivilan, ganî tabelayan de, îlan û fealiyetê kulturê de ziwani xo nîşan bido.

Sebebê vinî biyayîşê ziwani de tesîro en gird hetê “ekonomi û civakî de” bêqîmet biyayîş o. Hetê perwerde û kulturî de gurwiayîşê ziwani qîmetê/erciyayîşê ci berz keno û wastekê musayîşê ziwani vêşî keno. No prosesi de perwerde kerdena pîlan û binkeyê ziwani yo teknîk û disiplînê akedemîkî ; bêro zaneyene ke estunê dinyayê moderni de payra mendena û duşt berzkerdena ziwani yê

Rastiyêna ke, perwerde hîmê her çiyî yo. Seba ke ziwaneko sey Kirmanckî (Zazakî) binê vîndîbîyayîşî ra bixelisîyo, ganî tena keye de nê,

Perwerde de fekê cîya-cîyayê ke(zey Pîran, Dêrsim, Çewlîg yan Sêwrege) bêrê yew ca û mîyanê înan de ziwaneko ortax ê nuştişî virazîyo. Bi nê hawayî, çekuyê ke ma xebitnenê, seba her kesî zelal benê.

Zafê ma bi hawayêko fekkî qisekerdene musayê, labelê ray û qaydeyê ziwani (zê nêr û makî, babetê nameyan û deman) ganî bêrê perwerde kerdene. Wexto ke perwerde bibo, kesê ke qisey kenê, bi xo bawerîya qisey kenê. No semed ra standart kerdişê ziwani şerto sereke yo.

Ziwano ke nêro wendene, nêşkeno hewcedariyanê modernî bîyaro ca. Perwerde keno ke ma seba computer, fîzîk, felsefe û hunerî çekuyanê xo yê xomalî virazî.

- Seba domanan ganî bikayan, bi tîyatroyan û bi kîtabanê rengînan perwerde bêro dayîne.
- Seba pîlan zî ganî gramer û hîmê nuştişî (alfabe) bêrê nîşandayîne ke ê zî bişîkê kîtabanê neweyan biwanê û binusê.

**Eke ma zîwanê xo mekteban de, kursan de û warê dijîitalan de bimusnê, o wext vîndî nêbeno.**

**Zîwanêke nîno nuştene û di mîyanê keyeyî de nîno qiseykerdene, merde yo.**

## Di Wêjeya Devkî Ya Kurdî De Jin: Jin Bîra Veşartî Ya Wêjeya Devkî Ne

Devrîm Demîr-10 Mayıs 2026



***Jina Kurd bi rêya gotinê bêdengiya ku li ser wê hatiye ferzkirin şikandiye; wê ji bêdengiyê zimanek, ji tepeserkirinê vegotinek afirandiye***

Wêjeya devkî ya Kurdî ne tenê kevneşopiyeye vegotinê ye ku ji nifşekî bo nifşekî din tê veguhestin; ew yek ji hilgirên herî zindî yên bîrek berxwedêr, dîroka tepeserkirî û nasnameya gelekî ku li hebûn û berdewamiya xwe digere ye. Jin di vê gerdûna fireh û kûr a gotinê de kirdeya herî avaker û berhemdar e. Lê di heman demê de ya ku herî zêde nehatiye dîtin dîsa jin e. Di vê derê de jin ne tenê vebêj e. Ew, fîgureke navendî ye ku vegotinê teşe dike, wateya wê diafirîne û li dijî demê wê diparêze. Lêbelê ev navend di dîrokê de bi piranî di bin siya vegotinên mêrê serdest de hatiye veşartin; dengê jinê an hatiye anonîmkirin an jî bûye temsîlek nerasterast.

Di wêjeya devkî ya Kurdî de, jin di stranên dengbêjiyê de dengê navlênkirî, bîra ku di kûrahiya kilaman de veşartî û aqilê damezrîner yê çîrokan e. Hilberîna jinê bi rîtmek nerm a lorikekê dest pê dike; tovê ziman, nasname û aîdiyetê bi peyvên pêşîn yên ku dayik ji zaroka xwe re dibêje tê çandin. Piştî ew peyv di zêmara de dibe zimanê şînê yê kolektîf. Dibe dengvedana wendahiyan, xizaniyê û jiyanên hilweşiyayî. Di destanan de, dibe dengê berxwedanek dîrokî; serhildêrî, rûmet û têkçûyîna bi hev re tîne zimên. Jin ne tenê vebêj e, ya ku vegotinê dide jiyîn, vediguherîne û her carê ji nû ve ava dike ye. Her çiqas neyê nivîsandin jî dengê wê di bîra civakî de olan dide û ew xetê berxwedêriyê ya veşartî lê domdar di navbera nifşande dihone.

Di nav sînorên hişk ên civaka feodal de hebûna jinê di qada gelemperî de bi sînor bû û dengê wê pir caran bi qada taybet ve hat sînordarkirin. Lêbelê tê dîtin ku ev sînordarî jî vediguhere berhemdariyek afirîner. Jinê cihê ku ew lê hatibû asêkirin veguherand qada hilberînê; wê mal tenê wek cihekî jiyanê nedît, di heman demê de mal kir kargeheke peyv û wateyê jî. Çîrokên ku li ber tenûran, li hewşan û di şevên dirêj yê zivistanan de dihatin gotin; êş û hêviyên hevpar di van devaran de zêde bûn. Di şert û mercên ku nivîs an negihîşt an jî bi sînor bû de, axaftin bû forma herî bihêz a xweîfadeya jinê. Ziman hem di destê wê de hat parastin û hem jî ji nû ve hat biteşekirin.

Ev hilberîna jinê ji veguhestineke çandî wêdetir, di heman demê de naverokeke kûr a polîtîk jî îfade dike. Jin di zêmarên xwe de tenê şîna xizmên xwe yê ku wenda kirine nagirin; wêraniya şer, barê giran yê xizaniyê, parçebûna ji ber koçberiya bi darê zorê û şopên veşartî yê tundiya mêran jî tînin zimên. Şîna dayikekê ya ji bo zaroka xwe yê wenda di heman demê de dibe şahidiya serdemekê jî. Ji ber vê yekê wêjeya devkî ya Kurdî ne tenê cihê xweîfadekirinê ye ji bo jinê. Di heman demê de pratîkeke berxwedanê ye jî. Jina Kurd bi rêya gotinê bêdengiya ku li ser wê hatiye ferzkirin şikandiye; wê ji bêdengiyê zimanek, ji tepeserkirinê vegotinek afirandiye.

Her çiqas kevneşopîya dengbêjiyê pirî caran bi fîgurên mêran hatibe pênasekirin jî, hebûna dengbêjên jin vê çîroka yekane ji binî ve dihejîne. Dengbêjên jin ne tenê hilgirên vê kevneşopiyê ne, ew di heman demê de wê vediguherên wê ne jî. Stranên wan rastiyeke xavtir, rasterasttir û pir caran jarring di nava xwe de dihewîn in. Lewre dema evîne vedibêje jî, ew lêpirsîna têkiliyên xwedîtiyê dike; dema ku êşê vedibêje, ji aliyê din ve balê dikşîne ser newekheviyên civakî jî. Di straneke ku ji devê jinê tê bihîstin de, pir caran ji vegotina çîrokek takekesî wêdetir serpêhatiyek kolektîf tê dîtin û bihîstin.

Hebûna jinê a di wêjeya devkî de xwedî rastiyeke hilgir û parêzvaniya çandê ye jî. Berdewamiya zimên, veguhestina kevneşopîyan û parastina bîra kolektîf piranî bi saya keda jinê ya nedîtî gengaz bûye. Bi taybetî di demên ku Kurdî qedexe bû û hewl dihat dayîn ku ji qada giştî ya jiyanî bê paqijkirin de, jinê bi zindîhiştina zimên a di nava malê de berxwedanek bêdeng lê ewqasî jî bi bandor birêxistin kir. Jina ku ji zarokên xwe re bi kurdî lorand, bi kurdî çîrok vegot û ziman di jiyana rojane de zindî dihişt, di esasê xwe de bingeha xweparastina hebûna gelekî ava kir. Ji ber vê yekê jin ne tenê kirdeya vegotinê ye; ew di heman demê de parêzvana herî bihêz a zimên û nasnameyê jî.

Lêbelê pêkhateya feodal û feraseta serdest a mêran bi piranî ev rola jinê ya pêşengtiyê nedîtbar kir. Peyvên ku ji hêla jinan ve hatine hilberandin bi piranî hatine anonîmkirin; bi riya belavkirina vebêjên mêr xwedîtiya wan hatiye veşartin. Ev ne tenê çavnebariyek an jî îhmalek e; ev pratîkek sistematîk a desteserkirin û ji nû ve li gorî xwe nivîsandina ked û hilberîna jinê bi xwe ye. Keda jinê bi awayekî bênavlekîrî hatiye belavkirin. Dengê wê wekî ku dengê kesên din be hatiye pêşkêşkirin. Lêbelê tevî van hewldanên tunehesibandî jî, jinê di tevînekên kûr yê wêjeya devkî de şopa xwe hiştiye, dengê wê tevî her tiştî jî wenda nebûye.

Îro bi pêşketina tevgera jinên Kurd re ev mîrateya dîrokî dîsa berbiçav dibe. Rola jinê a di wêjeya devkî de ji nû ve tê nîqaşkirin, ji nû ve tê nivîsandin û li cihê wê yê rast tê bicihkirin. Ev ne tenê pêvajoyek telifkirina kêmasiyên ku berê hatine kirin, di heman demê de hewldaneke ku zimanê pêşerojê jî saz bike ye. Ji ber ku wêjeya devkî ne tenê dengvedaneke ji rabirdûyê ye; di heman demê de zimanê damezrîner yê pêşerojê ye jî. Di wêjeya devkî ya Kurdî de jin ne kirdeyek ku mehkûmî bédengiyê bê kirin e; berevajî vê, ew hêza ku zimên bi xwe diguherîne ye. Dengê wê ne tenê cureyek vegotinê ye; ew teşeyekî berxwedanê ye. Û ev berxwedan li dijî feodalîzmê, serdestiya mêran û hemî cûreyên zordariyê hîn jî olan dide. Ji ber ku jin bîra veşartî ya çandî û wêjeya devkî ye.

Îro ev dengê dîrokî êdî ne dengê ku tenê di kevneşopiya devkî de mabe ye, di heman demê de di wêjeya nivîskî de jî êdî hêzeke berbiçav e. Jinên Kurd êdî di gelek qadan de hebûna xwe mîsoger kirine. Jina Kurd ji helbestê bigire heta romanê, ji hilberîna akademîk bigire heta tomarkirina vegotinên devkî, di qadek berfireh de hem wek kirde hem jî wekî hêzek damezrîner cih digire. Ew êdî ne tenê hilgir e, rasterast çîroka xwe dinivîse, nav lê dike û xwedî li dîroka xwe derdikeve. Ev tê wateyê ku biqasî ku deng jinê yê ku berê nenas hatibû hiştin xuya bûye, ziman û rêça wêjeyê jî hatiye guherîn. Her ku temsîla jinê di wêjeya Kurdî de zêde dibe, vegotin karekterek pîralî, resen û kûrtir digire. Bi vî rengî, dengê jinê bîranîna ji rabirdûyê mîras mayî hildigire pêşerojê û deriyê asoyek nû ya wêjeyî û rewşenbîrî vedike.

## Eril Edebiyata Karşı Bir Duruş: Leyla Erbil

Didem Yılmaz-10 Mayıs 2026



***Toplumda bir tehdit oluşturmaması için üzerinde kurulan baskı, kadını bir çerçeve içine hapseder; Erbil'in öykülerindeki kadınlar, bu hapsolmuşluk sorununun karşısına özgürlük ve varoluşu koyan kadınlar olarak karşımıza çıkar. Bu öykülerde kadın, tehlikeyi her zaman yanı başında hissetmekle birlikte mücadeleye devam eder***

Dayatmacı kültürün hayat bulduğu evden çıkıp yaşam alanını genişleten kadının feminist söyleme ulaşarak tekçi, eril edebiyat yazarları tarafından “alışılmışın dışında olmakla” suçlanması 1960 ve sonraki yıllara tekabül eder. 1960 yılı sonrasında eleştirilen bu yazarların arasına giren isimlerden biri Leyla Erbil olur.

Kemikleşen edebiyat anlayışına başkaldıran Leyla Erbil, yazarlığın ölçüsünü şu şekilde ortaya koyar: “Bizden önce tek taraflı olarak erkeklerce örülmüş bulunan edebiyat düzeninde yerimizi almamız gerekiyor.” (Karaca 2006: 202) Eril anlayışın yarattığı kadın algısı, ekonomik ve siyasal alanda cinsiyet ayrımcılığı, siyasal ve sosyal değişimlerin

bireydeki yansımaları Leyla Erbil'in kaleminin ucunda olmuştur her zaman. **Erbil'in vurgusu "tabuların altında en çok kadının ezildiğine" işaret eder.**

Varoluşçuluk anlayışı temelinde insan, özünü kendi oluşturur. Bu özünü oluşturma sürecinde savaşı, zulüm görür. Bu koşullar insanı bunalıma sürükler. Öykülerinde varoluşçu anlayışı benimseyen Erbil'in öykülerinde bu bunalım, varoluşsal sebeplere dayandırılır. Yazar, bireysel varoluş sorunlarını kadın ve kadın sorunu üzerinden dile getirir. Bunalım hali, kadının üzerinden söküp atamadığı bir haldir.

Leyla Erbil 1960, 1968 ve 1977'de yazdığı Eski Sevgili, Hallaç ve Gecede öykülerinde kadınları özellikle ana karakter olarak seçer ve öykülerini, kadının ezilmesine hizmet eden toplumsal cinsiyet rolleri, baskı ve değişmeyen değer(!) yargılarına karşı bir direniş olarak yazar. Hem işlediği konuların bağlamı ve mahiyeti açısından hem de öykünün geleneksel kalıplarını yıkması bakımından edebiyat dünyasında adını duyuran Erbil'in öyküleri hem biçimsel açıdan özgündür hem de felsefik, politik ve psikolojik çizgileri, vurguları taşır. O, öykülerinde hem dilin geleneksel söz dizimi kalıplarını kırmış hem de eril edebiyat anlayışını yıkan tahlilleri ortaya koymuştur.

**Erbil'in öykülerinde yansıttığı kadınlar aynı zamanda yazarın görüşünü de temsil eder: "Başkaldıran, direnen kadın önce kendini anlamayı öğrenecek sonra varoluşunu gerçekleştirecektir."**

Toplumda bir tehdit oluşturmaması için üzerinde kurulan baskı, kadını bir çerçeve içine hapseder; Erbil'in öykülerindeki kadınlar, bu hapsolmuşluk sorununun karşısına özgürlük ve varoluşu koyan kadınlar olarak karşımıza çıkar. Bu öykülerde kadın, tehlikeyi her zaman yanı başında hissetmekle birlikte mücadeleye devam eder.

Leyla Erbil'in öykülerinde kendine yabancılaşan, cins kimliğini merak eden kadının varoluşsal sebeplerden kaynaklanan huzursuzluğu ve yalnızlık hissi görülür. Erbil, kadınların toplumda "kimliksizleştirilmesi" durumunu öykülerine yansıtır. Öykülerde erkek karakterlerin ismi belli olmakla birlikte kadınlar isimlidir. Kadın, onun öykülerinde "aynı toplumdaki gibi" kimliksizdir, edilgendir. Buradan hareketle Erbil'in öykülerinde kadının sürekli toplumun değer yargılarına göre yaşama zorunluluğu hissetmesinin kendi benliğini yitirmesine yol açtığını görürüz. Erbil'in "Öyküsüz" isimli öyküsünde özne değil nesne olan kadının kendisi için var olma çabasını, feminist cümlelerle okuruz.

Kadının kendini deęiřtirme ve özgürleřtirme isteęini “Ben ilkel ve gür bir kendini deęiřtirmeyi, özgür bir seviye akmayı istiyordum.” diye ifade ediyor Leyla Erbil ve dayatılan kadın-erkek iliřkilerini reddediyor. Bu nedenle de aşkın sadece erkek istedięi için deęil kadının da isteęi üzerine olmasını bekliyor. Erbil’in öykülerindeki kadınların piřmanlıklarla dolu evlilikleri, aynı zamanda kadını kısıpaca alan bir özgürlük düşmanıdır. Onun eserlerinde kadın, erkekle yaşanan zıtlıklarını dile getirir. Kadın sevinirken erkeęin mutsuz olması, kadının eğlenirken erkeęin ölmeyi istemesi, kadın erkeęi övdükçe erkeęin kendini eksik görmesi bu zıtlıkların bir kısmını ifade eder. Bu zıtlıkların doęurduęu sonuç olarak ortaya çıkan kadının aldatma itirafı, zihinsel ve cinsel arzularını baskı altına alan toplumsal yaklařıma karşı bir isyan nitelięi tařır.

Leyla Erbil, öykülerinde kız çocuklarını da mutsuz olarak işler. Baba sevgisinden yoksun, annesinin yasak koyucu cinsellik anlayışının baskısı altında büyüyen kız çocuklarının ezilmeleri de anne gözetiminde gerçekleşir. Erbil’in öykülerinde kız çocukları; babaları ve anneleri tarafından cinsel organları yakılan, pencerelerden atılan, ruhları sakatlanmış çocuklar olarak karşımıza çıkar. Bu öykülerdeki anne-kız iliřkileri bir çeliřkiyi de beraberinde getirir: Anne, kendi varoluř sürecini gerçekleřtirme peşinde kořarken aynı alanı kız çocuęu için açmaz ve kız çocukları annenin istedięi türde bir yařantının içine hapsolür. Bu çatıřmada kız çocuęunun anneye isyan eden tavrı ile Erbil, bu kez de kız çocuęunun varoluř sürecini, sancısını ortaya koyar. Anne-kız çatıřmasındaki annenin edilgenlięi, kutsallıęı, düzene hizmet etme eęilimi yazar tarafından eleřtirilir. “Anne kutsallıęının” eleřtirilmesi de edebiyatta çok rastlanan bir durum deęildir. Leyla Erbil, öykülerinde anneyi ön plana çıkarırken aslında toplumdaki anne algısının da karşısında durur.

Edebiyatta kadın olmak da kadını işlemek de zordur. Leyla Erbil, bu zorluęu aşmayı bařaran ve kadını gerçeeklięiyle önümüze koyan bir yazar olmuřtur her zaman. Erbil’in kadını eleřtiren cümleleri “kadını kendini tanımaya ve içinde bulunduęu girdaptan çıkmaya zorlayan” bir amaç edinmiřtir. Ařkı, öfkeyi, mücadeleyi kadının varoluř sancıları içinde yer alan olgular olarak deęerlendiren Erbil, öykülerinde bu tutumunu acı, zulüm ve bencillikler üzerinden anlatmıřtır. Kısacası Erbil, güzel olan kadını “çirkinlikler” ile anlatarak kadına içinde bulunduęu durumu gösterir ve bu durumdan çıkması gerektięi uyarısını yapar. Yazarın edebiyat dünyasındaki bařarısı da bu eleřtirel tutumundan ileri gelir.

***Leyla Erbil Kimdir?***

Leyla Erbil (12 Ocak 1931-19 Temmuz 2013) Türkiye Yazarlar Sendikası kurucu üyesi ve PEN Yazarlar Derneği üyesidir. 1996 yılında F-Tipi cezaevleri ve açlık grevlerine dikkat çekmek için ölüm orucunun 69. gününde imza kampanyası başlatan yazar, 2002 yılında PEN Yazarlar Derneği tarafından Nobel Edebiyat Ödülü'ne aday gösterildi. Leyla Erbil, Türkiye'den bu ödüle aday gösterilen ilk kadın yazar oldu.

***Okuma Önerisi Olarak Leyla Erbil Eserleri:***

- Hallaç
- Eski Sevgili
- Gecede
- Tuhaf Bir Kadın
- Karanlığın Günü
- Tuhaf Bir Erkek
- Zihin Eserleri
- Leylim Leylim: Ahmed Arif'ten Leyla Erbil'e Mektuplar